

# TERORA – NSU: DEWLET Û NAZÎ BI HEV RE NE

**MESH: 01.11.2014 SHEMÎ**

**SAET/KATJIMÊR: 13:30**

**CIH: U-BAHN GESUNDBRUNNEN / HANNESOBEK-PLATZ – BERLIN**

**EM LI DIJÎ NIJADPERESTIYÊ**

# TÊBIKOSHIN!

Doza NSU ya li Mûnihê ev bêtirî saleke berdewam dike, ne tê ronîkirin, ne dad (edalet) pêktê û ne jî dawî li tundiya (shîdeta) nijadperestî tê. Babeta ku zelal e ev e: Rêxistineke ku ji NEO-NAZIYAN pêktê, ji aliyê Saziya Parastina Destûra Bingehîn a Almanya ve hatiye fînanse kirin û polîs jî parastina wan kiriye. Dadgeh, karmend û sîxuran diparêze, erkên Saziya Parastina Destûra Bingehîn jî tê zêdekirin. Mexdûr û qurbaniyên kushtinên nijadperestî jî di bin shik û gumanê de tên hishtin û dengên wan tê birînê. Em pirs dikin: Bi rastî jî hate ronîkirin ku ka NSU chi ye? Kî ye? Pishtî ku NSU hate „eshkerekirin“ heta niha 220 bûyerên ku NSU wek kujer tê nîshandan, hatine chespandin. Ango komikên terorê yên NSU yê li kiryarên xwe berdewam dikin. Shewat û rûxandinên li ser mizgeft, sînagog, kampên penaberan, mal û xaniyan berdewam dikin. Hêzên ewlekariyê yên li kampên penaberan êshkenceyê li mirovan dikin. Yên seriradikin tên lêdan, birchî têne hishtin û têne dersînorkirin. Lê li gorî feraseta serdest a dewlet û civakê li Almanya nijadperestî nîne. Dewlet û civak li hember nijadperestiyê bêdeng e, lê emê bêdeng nemînin. Em wan kesên ku di cînayetên NSU de birîndar bûne, hatine kushtin bi bîr tînin, êsh û jana kes û nasên wan jî par ve dikin. Em têkoshîna penaberan a ku ji bo siyaseta dijmirovî - nijadperest a penaberiyê bidawî bibe, destek dikin.

**EM DI SALA 3 YÊ YA „RONÎKIRINA“ CÎNAYETÊN NSU DE MESHEKE GIRSEYÎ LI DAR DIXIN. HÛN JÎ JI BO VÊ MESHÊ VEXWENDÎ NE... ÊSHA XWE, JANA XWE, HÊRSA XWE Û HÊVIYÊN XWE BI RAYA GISHTÎ RE PAR VE BIKIN. NIJADPERESTÎ DIKUJE!**

**DAXWAZÊN ME:**

+ **DIVÊT SAZIYEKE SERBIXWE KU LI DIJÎ NIJADPERESTIYA DEWLETÊ TÊBIKOSHE BÊTE DAMEZIRANDIN.**
+ **DIVÊT BÊ RONÎKIRIN KU KÎJAN SAZIYÊN DEWLETÊ DI NAV RÊXISTINA NAZIYAN DE BÛNE.**
+ **DIVÊT TEVAHIYA RÊXISTINÊN VESHARTÎ YÊN ÎSTIXBARATÎ BÊNE BELAVKIRIN.**
+ **BILA DAWÎ LI DERSÎNORKIRINÊ BÊ, KAMP BÊNE GIRTIN Û MAFÊ RÛNISHTINÊ JI BO HER KESÎ BÊ DAYÎN.**
+ **DIVÊT TEVAHIYA QANÛN (ZAGON) ÊN NIJADPEREST YÊN TAYBET BÊNE RAKIRIN.**
+ **CHAVDÊRÎ (KONTROL) A POLÎSAN YÊN NIJADPEREST BÊNE SEKINANDIN!**
+ **DIVÊT NAVÊN MIROVÊN KUSHTÎ Û QURBANIYAN LI SIKAKAN BÊ DAYÎN!...**